

Şêwirmendiya Malbatê

Carinan di têkiliyan de zehmetî derdikevin. Şêwirmendiya malbatê ya şaredariyê (komûnê) ji bo hevjin û malbatên ku dixwazin **pirsgirêk û nakokiyên** di têkiliyên xwe de bigirin dest piştgiriya gotûbêjan pêşkêş dike. Ev dikare mijarên wekî zehmetiyên di têkiliyêke berdewam an berê de, pirsgirêkên di navbera endamên malbatê de, an nakokiyên ku di dema veqetînê de derdikevin be.

Em ên ku di Şêwirmendiya malbatê de dixebitin, di warê mijarên jiyana hevserî de xwedî **pisporiya** taybet in. Armanca gotûbêjan ew e ku danûstendinê baştir bikin, têkiliyan xurt bikin û alîkariyê bidin dîtina çareseriyên ku bi kar tên.

Her çend Şêwirmendiya malbatê bi giranî ji bo mezinan be jî, pir caran bandor li ser zarokan jî çêdibe. **Têkiliyên mezinan** bandorê li ser zarokan jî dike, lewma rewşa zarokan, mafên wan û pêdiviyên wan weke beşekê di gotûbêjên bi dêûbavan re têne berçav girtin.

Şêwirmendiya malbatê **ji bo her kesî vekirî ye**, bêtî ferqê zayend, temen, meyla zayendî, nasnameya zayendî, etnîsîte, astengdarî, ol an jî baweriya din. Gotûbêj di bin **sirê** (sekretess) de ne, yanî tiştên ku tên gotin bêtî bingehekî qanûnî nayên parvekirin. Mafê te heye ku tu **anonîm bimînî**.

Şaredarî (komûn) mecbûr e ku şêwirmendiya malbatê ya bi **kalîteya baş** pêşkêş bike û karmendên bi perwerde û tecrûbeya guncaw hebin. Tu yê ku li piştgiriya digere, mafê te heye ku bi awayekî profesyonel û bi rêz werî pêşwazî kirin.

Ji bo randevûyekê ya bikaranîna gotûbêjan, dikarî bi Şêwirmendiya malbatê ya şaredariyê re têkevî têkiliyê.